

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

Bi xêr hatin!!



Demjimêr 11ê sibeha roja yekşembê 17ê nîsana 2011an, hersê rewşenbîrên Kurd Ebdusemed Hesên Mehmed(helbestvan), Umer Ebdê Ismaîl(helbestvan), Ahmed Fetah Ismaîl(rewşenbîr û xwediyê malê), piştî borandina 4 mehan di zindanê de, azad hatin berdan.

Bi gul, çîçek û beşdariya gelek rewşenbîr, welatparêz, nûnerên hin partiyên Kurd, rêxistinên mafên mirov û parêzer Kurd, girtiyên çand û peyva kurdî li bajarê Qamişlo hatin pêşwazîkirin.

Bi navê komîta NEWROZê, em xêrhatina helbestvan û rewşenbîrên xwe yên xoşewist dikin û bawerîya me ew e ku, paşeroj ne ji nijadperstî û quretiya milî re ye, lê belê, ew ji azadî, aştî, mafên mirov û gelan re ye.

Mam Xenî Bilûriyan Çav damrandin

Elmanya: Xenî Bilûriyan ku wek (Mam Xenî) tê naskirin duh 09.03.2011ê li mala xwe ya bajarê Koln ê Elmanya koça dawî kir. Mam Xenî yek ji kevneçalakvanên siyasî yê Rojhilatî Kurdistanê bû û di temenê 86 salî de koça dawî kir.

Bilûriyan, ji ber çalakiyên dijî hikûmeta Îranê bi giştî 25 salan di zindanê de maye û demake dirêj e li derveyî Îranê jiyana xwe derbas dike. Bilûriyan sala 1924ê li bajarê Mehabad ji dayik bûye û di 18 saliya xwe de dest bi karê siyasî kiriye. Yek ji damezrênerê (Rêxirawê Lawên



Kurd) bû, piştê bûye endamê yekemîn kongreya Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê. Mam Xenî, piştî darbeya 1953ê li Tewrêz bi cîh dibe û ji rojnameya organa Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê re dixebite, lê piştê li Sine tê girtin û 3 salan li Tewrêz tê zîndankirin.

Dema hat berdan hevsera wî (Merziye Sedîq) bi du keçan dûcanî bû, dubare hat girtin û emrê îdamê jê re derket. Lê, li ser daxwaza hinek kesayetiyên cihanî yên naskirî wek; General Dugel, Andre Maldro, Ehmed Sukarno û Cemal Ebdulnasir hikmê wî hat hilweşandin û bû heta hetayê.

Mam Xenî sala 1978ê di dema Şoreşa Îslamî ya Îranê de, ji zîndanê rizgar bû. Bilûriyan ku demake dirêj a temenê xwe li Elmanya derbas kiriye, di sala 1997an de kitêba bîreweriyên xwe bi kurdî li Swêd çap û belav kiriye.

bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, bila serê xwedî,dost û gelê Kurd sax be.

Ji malpera Newroz

Xebatkar C. Namiq jiyana xwe ji dest da

Di. 21 ê Avdarê siyasetmedar û têkoşerê bi nav û deng Cewher Namiq Selîm - Kurdistanana Îraqê- li Stokholmê çavên xwe damrandin .C.N ji endamên Kevin, zîrek û zana yê PDK Îraqê bû. Di helbijartina 1992 an ya Kurdistanê de, dibe endam û Yekemîn serokê perlemanê û ta sala 1999 an berdawam dike. Pişt re dev ji PDKê berdide û rexneyên xwe li rijîma siyasî û Îadara Kurdistanê dike.Û berê xwe dide dûriyê, li Siwêdê bi cîwar dibe .Roja 24ê, termê pakrewanê hêja digihe Kurdistanê û ji hêla Serok M. Berezanî, B. Salih , K. Kerkokî, Perlemantêr, dost,hogir û xwediyên tê pêşwazîkirin û li gundê wî – Berlotî –Nahiya Kellar- tê veşartin



bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, bila serê xwedî,dost û gelê Kurd sax be.